

OBAMA: "EM ÎRANA XWEDÎ ÇEKÊN ETOMÎ QEBÛL NAKIN"

► Piştî ku "Barack Obama" di hilibjartinên roja 4'ê Çiriya Paşîn a 2008'an ser ket, li bajarê Şîkagoyê konferanseke çapemeniyê lidar xist. Di beşek ji vê konferansê de, Obama bal kişande ser bernameya navikî ya Komara Îslamî ya Îranê û got: "Divêt civaka navneteweyî pêşgîriyê ji bidestxistina Îranê bi ekên Etomî bike". Barack Obama her wiha got: "Divêt piştgiriya Îranê ji rêxistinên terorîstî bihê rawestandin".



Amerîka berdewam Îranê bi piştevanî ji girûpên terorîstî û hevkarîya pere, çek û cebilxaneyan nemaze terorîstên li Îraqê tawanbar kiriye. Îran jî vê yekê red dike.

Buş Fermana Rewşa Awarte Derheq Îranê Dubare Kir

► "Georg W Bush" Serok Komarê Amerîka, ku heta meheke din dema Serokatîya wî a DYA'ê bi dawî dibe, fermanek der kir û tê de **rewşa awarte** ya derheq Îranê ku di dema serokatîya "Jimmy Carter" hatibû dayîn, bo saleke din dubare dirêj kir.

Buş di fermana xwe de, Îran weke gefeke mezin û ne normal ji bo ewlekariya neteweyî, siyaseta derve û aboriya Dewletên Yekbûyî yê Amerîkare hesabandiyê.

Wî li dor wê biryarê got: Têkiliyên Amerîkayê bi Îranê re hêj asayî nebûne, lewra rewşa awarte ya ku di 14.10.1979'an de hatibû ragihandin, bo saleke din dirêj dibe.

Komara Îslam a Îranê û Amerîkayê ji sala 1979'an şûnde ku Balyozxaneya wî welatî ji aliyê Xwendekarên alگیرên Xomeynî hatibû dagirkirin, pêwendiyên fermî ên dîplomatîk tu ninin.



Dîroka Bêpariyê



2

Li Zanîngeha Urmîyê Gireva Nerazîbûnê



4

Dem Dema Guhartinê



5

Diyardeyek Bi Navê Helatina Mêjiyan



7

Ked û Jin



9

Dîroka Bêpariyê

Arif Nadirî

Rast e ku dîroka Kurd, dîroka bêparî û tepeskerina di bédengiyê de bûye, lê di vê navberê de Rojavayê welat berengarî perçiqandinekî berdewam bûye. Rojava ku beşa biçûk a Kurdistanê Kolonî di bin hejmoniya xwesepînerên Sûreyaya Koloniyalîzm de ye, 10 ji sedê ya nifûsa wî welatî pêk tînin. Lê rejîma Sûriyê jî herwek dagirkerên din, ne tenê hebûna neteweya Kurd înkâr kiriye û beşek ji axa Kurdistanê di çarçoveya tixûbên destkird û zilm û zora xwe de hêlaye, belku amade nebûye ku weke hevvelatîyekî pilexwartir ji hevvelatîyên Erebbên wî welatî mafên wan yên herî destpêkî jî bo dabîn bike. Lewma bi dirêjahiya zêdetir ji niv sedsala derbasbûyî de, Kurd weke koçberê hesibandine ku parek ji axa Erebbistanê (Sûriyê) qorix kirine. Kiryarekî hovane ku mînaka wê di dîroka nû de bi dijwarî û kêmi dest dikeve.

Di vê pêvajoyê de, çendîn kompoyên nepenî û eşkere bo dîrxistin û jinavbirina neteweya Kurd hatine çibicîkirin û meşandin.

Di çarçoveya pirojeya Zinara Erebbî de, rejîmê cehda guherîna demografiya herêma Kurdakincî ya "Hesekê" da û ji aliyekî din ve, pirojeya çêkirina navberê pêkhatî ji Erebban bo cudakirina Kurdên Rojavaya welat bi dirêjahiya 850 kilometr tixûbên hevpar tevî Bakûr û herwiha Başûrê Kurdistanê xiste biryara çibicîkirina pîlanên xwe ve. Her di doma van pîlanên de, di 5'ê Çiriya Pêşîn ya sala 1962'an de, zêdetirî 300 hezar Kurdên Rojava pênaseya wan jê hate standin û ji hemû mafekî hevvelatîbûnê hatine bêparkirin.

Di sala 1963'an de, Partiya Bees sînorê Parêzgeha Hesekê ji Kurdan da çolkirin û di cihê wan de Erebbên akincî kirin ku di sala 1973'an şûnde pêvajoyekî bileztir bi xwe ve girtiye.

Di wan salên dawiyê de jî, rê û resmên cejna Newroza bixwîn a Rojavayê welat bi taybetî bereberê Newroza bixwîn a sala 2005'an, mînaka herî berçav a dagirkerî û pêbendnebûn bi pîrensîpên mirovahiyê û berpîrsiyariyên hukimdariyê bû. Piştî hiloşîna rejîma Bees li Îraqê û hatine rojeva gelaleya Rojhilata Navîn ya

mezin ji aliyê Amerîkayê ve di sala 2003'an de, rejîma Sûriyê jî yek ji wan welatan bû ku kete ber rexne û gazindeyên dewleta Amerîkayê û gumana guhartineke kûr di wî welatî de hate holê. Terora **Refîq Herîrî** li Lubnanê, derkirina arteşa Sûriyê jî wî welatî, hatina terorîstan ji axa Sûriyê ve bo hundirê Îraqê, hevpeymanî tevî Îran, Hizbullah û Hemasê, serhildana opozîsyonî û alternatîva li derveyî welat bi rêberiya **Ebdulhemîd Xedam** û wd..., komek faktor bûn ku bibûn egera guhartinên zêdetir di wî welatî de. Her di bin van zext û givaşan de, **Beşar Esed**, çendîn caran di van salên derbasbûyî de soza çareserkerina arîşeya zêdetirî 300 hezar Kurdên bênasname û bêpar ji xizmetguzariyên hikûmetî da, lê niha ku egera êrîşên derveyî bo ser Sûriyê kêmbûye, Sûriyê serbare pêstevanîkirina fermî a xwe ji êrîşên leşkerî yên Turkiyê bo ser Herêma Kurdistanê di zistana derbasbûyî de, niha jî bi derkirina biryara hejmar 49 a sala 2008'an a hikûmeta Sûriyê, asteng û girêpêç li hember xudanerd û kirîn û firotina erd û mal, derbaçêkirin û heta kirêdana erdê û çandinê jî çê kiriye, kiryarek ku bi awayekî sistematîk dibe egera koçberkirina xelkê Kurd li herêmê û aware û derbiderkirina wan di herêmên Erebbakincî yên wî welatî de.

Kurdên Rojavayê welat, di warê seha

neteweyî, kurdistanîbûn û nirxdayîn di vê pêxemê de tevî vê hindê ku hejmara wan kêmbûn, lê bi berçavgirtina vê rastiyê, zêdetir rastî jinavçûn û tunebûnê hatine.



Arif Nadirî

Ew hertim piştewanên malî û canî yê bizava neteweyî ya Kurdên Başûr û Bakûr di rojên herî dijwar de bûn û nemaze zaf caran di pêxema berjewendiyên parçeyên din de amade bûne ku bi awayên demkî li hember daxwazên berheq yên xwe de bédeng bisekinin. Lewra di rewş û zirûfêke han a dijwar de ku Kurdên vî parçeyê welat tê de dijîn û bi awayekî sistematîk û rojane berengarî tund û tûjî, tirsandin, teror û bêparkirin ji mafên herî destpêkî yên mirovî û heta hevvelatîbûnê tên, erkê neteweyî yê gelê Kurd bi gîştî û bi taybetî partî û rêxistinên Kurd û Kurdên akincî yên derveyî welat e ku bi mifahwergirtin ji tev alav û amûrên ber destê xwe, bi meş û girevên şermezarkirinê, ragihandin û raya gîştî ya cîhanê û welatên demokratîk û navendên mirovhez, ji asimîlekirina tuxmî û jînosayda sipî a gelê Kurd di Kurdistanê bindest a Sûriyê de, haydar û neçar bi helwêstgirtinê bikin. Ji ber ku girîngbûna doza Kurd di hemû parçên Kurdistanê parvekirî de ye.

Ji Soranî bo Kurmancî: Dara Natiq


Li Ser Rewşa Xirab Ya Kurdan Li Îranê, Serokê PEN'ê Nameyek Ji Rêveberên Komara Îslamî Re Şand

Seroka PENê Kathmann ji Ehmedînjad re: rewşa kurda li Îranê baştir bikin!

Seroka duyê ya PENa navnetewî "Lucina Kathmann" bi nameyek fermî ji rêvebirên rejîma Îranê xwest ku nivîskarên Kurdan bêne berdan û rewşa Kurdan baştir bikin.

Weke tê zanîn berî niha Serokê PENa Kurd Dr. Zerdeşt Haco, li ser rewşa Kurdistanê û girtina nivîskarên Kurd PENa navnetewî xistibû hereketê. Ji PENa navnetewî rêvebirê beşa Rojhilata Navîn Cathy McCann, li dijî girtina nivîskarê Kurd Hemîd Dilbahar derketibû. Weke berdewama çalakiyên PENa navnetewî, gava duyê ve carê ji aliyê Xanim "Lucina Kathmann" hate avêtin.

Di vê nameyê de, navenda PENa navneteweyî ku mezintirîn dezgeha nivîskaran ya cîhanê ye, daxwaz ji rêveberên Komara Îslamî kiriye ku rewşa



Kurdan li Îranê baştir bikin û nivîskarên Kurd Ednan Hesenpûr, Hîwa Botîmar, Mesûd Kurdpûr û Saman Resûlpûr serbest berdin.

Jêder: EuroKurd Human Rights

Li Ser Bînpêkirina Mafên Mirovan Di Îranê De Sekreterê Giştî Yê Neteweyên Yekbûyî, Bo Cara Yekemîn Bi Xurtî Îran Rexne Kir

Azad Kurdî

Her ji destpêka hatne serkara hikûmeta Îslamî li sala 1979'an di Îranê de, Rêxistina Neteweyên

Yekbûyî weke organîzasyonê herî mezin a siyasî û navneteweyî, çend Komîserê taybet ji bo nîrxandin û aqahdarbûn li ser rewşa mafê mirovan di Îranê de diyarî kirine. Hetanî îro rayedarên rejîma Komara Îslamî a Îranê bi awayên cur bi cur karşikênî tevî rêveçûna xebat û memûriyetên (mizûriyên) wan Komîserên Neteweyên Yekbûyî kiriye û heta gellek caran rêya sefer û hatina wan ji bo Îranê jî nedaye. Di wan derfetên ku rê ji wan re dihate dayîn û seredana Îranê dikirin û kirine, nedikarin bi dilxwazî, vîn û îradeya xwe û li gor memûriyeta diyarîkirî a wan, bi awayekî azad û serbest tevî wan kesan gotûbêjê bikin ku bixwe dixwastin zanyariyên hewce ji wan werbigirin û li ser bînpêkirina mafê mirovan di Îranê de agahiyên rast û eseh kom bikin. Lewra ew cih û kesên ku Komîser û şandên RNY'ê ji bo nîrxandina rewşa mafê mirovan di Îranê de serî lêdida, pîrranî berê ji aliyê karbidestên rejîmê ve dihatin diyarîkirin û amadekariya tekûz ji bo rûbirûbûna ew cih û kesên ku ji bo Komîseran hatibû destnîşankirin, di hate berçavgirtin. Me dît ku bo carekê jî rayedarên Komara Îslamî a Îranê nehêlan Komîserên RNY û şandên bi wan re seredana wan bajar û parêzgehên bikin ku cihê jiyan û niştecîhbûna neteweyên bindest û zulmîjêkirî ên Îranê ye ku bi awayên sistematîk mafên wan tê bînpêkirin û herwiha serkut, girtin, îdam, zilm û perçiqandin bi hemû şêl û rêyekê li ser wan tê meşandin.

Mixabin di heyamê çend salên borî de ku pîrsa Etomî a rejîma Komara Îslamî ji bo civaka navneteweyî ê bûye pîrsgirêkeke mezin û beşek ji rojeva dîplomasiya welatên mezin ên cîhanê bi xwe re mijûl kiriye, doza bînpêkirina mafê mirovan li Îranê heta astekê hatiye jibîrkirin û bi tevahî ye ketiye peravêzê, lewra ji ber bal nedana raya giştî li vî warî re, rejîma cinayetkar a Komara Îslamî li Îranê bi awayekî berfirehtir ji caran û tevî bikaranîna hemû awayên serkut û perçiqandinê, gelên Îranê û azadixwazên Îranî tepeser kiriye.

Lê rapora meha "October" (Çiriya Pêşîn) ya 2008'an a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî derbarê rewşa nebaş û kambax a mafê mirovan di Îranê de, ew jî bo cara yekemîn ji zimanê Sekreterê Giştî yê

wê saziya navneteweyî ve, bala medya û raya giştî û nemaze rêxistinên parêzerê mafê mirovan û hêzên Opozîsyona Îranê bo aliyê xwe kişand û ev rapora RNY weke gaveke erênî û bicî li dor protestokirina pêvajoya bînpêkirina mafê mirovan ji aliyê hikûmetêke dîktator a zal bi ser welateke pîrnetewe weke Îranê hate pênasakirin.

Ban Kî Mon, Sekreterê Giştî yê RNY rejîma Îranê ji ber derbasbûyîya xirab a mafê mirovan bi tundî rexne kir û di axavtina xwe de got, nîgeraniyê zaf li dor zêdebûna hejmara îdamên heta girtin û azar û ezyetkirina kêmaniyên neteweyî û olî ên Îranê û nemaze serkut û zexta li ser jinan di holê de ye ku vê yekê rewşa mafê mirovan di wî welatî de aloztir kiriye. Sekreterê Giştî yê NY di rapora



xwe de qala vê çendê kiriye ku hejmara îdamên welatiyan di çend hevên borî de zêde bûne û tenê di rojekê de 29 kes hatin lidarvekirin, nemaze îdamkirina kesên bin temen 18 saliyê.

Di pareke din a vê raporê de, Ban Kî Mon, bi hûrî û berfirehî bal kişandiye ser rewşa aloz û nebaş a tevgera jinan li Îranê di dema du salên borî de û pêvajoya tund a girtin û dadgehîkirina çalakên tevgera jinan ji aliyê wê hikûmetê ve bi xurtî rexne dike û qala vê çendê dike ku qanûnên cenayî û sivil ên hikûmetê cudahiyan didanên û newekhev in û tevî pîvanên navneteweyî li hev nahên û zext û givaşa bo ser jinan pîr xurt û zêde bûye û heta ew zext û givaşên hikûmetê bo ser jinan sînoren taybetî ên jinan jî bezandiye û pîrsên şexsî ên weke lixwekirina kincan, pora ser, xawik û wd... jî li xwe digire. Sekreterê Giştî yê NY di rapora xwe li dor bînpêkirina maf mirovan di Îranê de, bi hûrî balê dikşîne ser ferq û cudahîdanan û azar û ezayeta li dijî jinan û tekez kiriye ku di hikûmeta Îslamî a Îranê de mafê jinan tê bînpêkirin û divêt rejîm bo ji holê rakirina vê rewşê û pejiwandina norm û standardên navneteweyî ên mafê mirovan derbarê jinan gavên bilez û

bibandor bavêje.

Li gora vê raporê, azar û êşandinên zayendî li dijî jinan bi awayekî berfireh di holê de ye û ew rêxistinên ku ji bo wekheviya mafê jin û mêran di Îranê de hewl û bizavê didin û dixebitin, hatine serkutkirin û bi xurtî di bin zext û givaşan de ne û xebatkarên vê tevgera berfireh a civakî hatine zindankirin. Di vê derheqê de Ban Kî Mon got: "Pîrsgirêk di wir de ye ku hikûmeta Îranê di hinek xalan de, mark û berçespa darûdestek û hokarê biyaniyan ji tevgera jinan dixê û çalakên wê bizava civakî bi van markane tawanbar dike û îdea dike ku ew tenahiya neteweyî a welêt tevlihev dikin û piştê bi van buxtanane wan ceza dikin".

Di doma rapora xwe de, Sekreterê Giştî yê NY dibêje: "Êrîşa bo ser mafê jin, xwendekar, mamosta, kedkar û girûpên din ên civakî ji bo me cihê nîgeraniyê ye". Ban Kî Mon, li gor wê rapora ku li ser rewşa nebaş ya mafê mirovan li Îranê ku ji aliyê komek karnasên wê rêxistinê ve hatiye berhevkirin, daxwazê ji rejîma Komara Îslamî a Îranê dike ku dest li serkut û perçiqandina xelkê wî welatî berde û zext û cudahîdanana li dijî jin, zarok, xwendekar, karker, mamsotayên xwendingehan, çalakên mafê mirovan û kêmaniyên neteweyî û olî bisekinîne.

Ban Kî Mon got: "Di sala borî de, aliyê kêman çend xalên kevîrbaran û îdamên li cihên giştî di Îranê de qewimîne. Her wiha di wê raporê de çend xalên birrîna dest û pê, qemçîlêdan, kuştinên gumanbar û xwekujiya girtiyan hatiye ragihandin".

Hêjayî gotinê ye ku rapora nû a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî derbarê bînpêkirina mafê mirovan di Îranê de, ji bo her 192 endamên wê saziyê hatiye şandin û baldan û baskirina rewşa nebaş a bînpêkirina mafê mirovan di Îranê de bo cara yekemîn ji aliyê Neteweyên Yekbûyî, nemaze ji zimanê Sekreterê Giştî yê wê saziya navneteweyî ve, dikaribe weke guhertinekê li dor helwestgirtin û şikandina tilisma bêdengî li hember jiyan û çarenivîsa gelên Îranê di bin siya hikûmetêke dîktator û azadîkuj weke Komara Îslamî a Îranê de bihê zanin heta ku çî din baskirina wê pêvajoyê di Îranê de nebe goriyê dan û standinên bazirganî û pêwendiyên dîplomatik û wd... û çî din pîrsa mafê mirovan di Îranê de nekeve peravêza dozên siyasî ên têkildarî Îranê di raya giştî a civaka navneteweyî de.

Li Zanîngeha Urmîyê Gireva Nerazîbûnê

Rapor: Dilvîn

Bi armanca şermezarkirina liv û kiryarên berpirsiyarên Zanîngeha Urmîyê, bêtirî 600 kes ji xwendekarên Kurd ên Zanîngeha Urmîyê, roja sêşem, 4'ê Çiriya Paşîn a 2008'an, seet 11-16'ê êvar li hember Perdîs Şehr(Avahiya Navendî a Zanîngeha Urmîyê) civiyan.

Di Civînê De Xwendekarên Kurd nerazîbûna xurt a xwe li hember fend û fêlên berpirsiyarên zanîngehê di hilbijartina Civata Senfî ya Zanîngeha Urmîyê de xuya kirin û desttêwerdana berpirsiyarên zanîngehê di nav kar û barên xwendekaran yê li dijî Kurdan şermezar kirin.

Di vê gireva nerazîbûnê de, xwendekaran daxwaza rakirina ferq û cudahîdananan di navbera xwendekarên Kurd û Azerî de kirin. Di dema gireva nerazîbûna xwendekarên Kurd de, Dr. Sidqî, serokê zanîngehê, Cehanbexş, serokê Parastina zanîngehê û Dr. Talêî, Cîgirê kar û barên xwendekarên Zanîngeha Urmîyê beşdar bûn.

Xwendekarên Kurd herwiha nerazîbûna xwe li ser rewşa xirab ya zanîngehê xuya kirin û berpirsiyaran jî soz dan ku şandeke 5 kesî ji bo şopandina daxwaziyên xwendekaran pêk bîne. Lê xwendekarên Kurd ên Zanîngeha Urmîyê biryar girtin ku heke daxwaziyên wan çibîcî nebin, ew dê gireva xwe a nerazîbûnê dom bikin.

Roja duşem, 04.11.2008'an ji, ji ber



ku ev çend sal in ku berpirsiyarên vê zanîngehê, rê nadin ku xwendekarên Kurd ji bo wê civatê bihên hilbijartin û berevaniyê ji mafên xwendekaran bikin, xwendekarên Kurd li dijî wê hilbijartina ne salim helwest girtin.

Ji ber nerazîbûna xwendekarên Kurd, rewşa zanîngeha Urmîyê aloz û qerebalix bû. Ji ber vê yekê jî, çend xwendekarên Kurd ji bo Navenda Parastina Zanîngehê hatin vexwendin. Di gireva nerazîbûna roja sêşem, 04.11.2008'an de, xwendekarên Kurd piştgiriya xwe ji xwendekarên gazîkirî ji bo Navenda Parastinê jî xuya kirin û kiriyara han şermezar kirin.



Zilm û bêdaletî derheq xwendekarên Kurd dimeşe

Hemû salê, di dema destpêbûna sala nû ya xwendinê de, hilbijartina nûnerên Civata Senfî ya Zanîngeha Urmîyê weke hemû zanîngehên Îranê tê lidarxistin. Ji her kolejek zanîngehê xwendekarek weke nûner ji bo Civata Navendî ya Giştî a zanîngehê tê hilbijartin û li wir berevaniyê ji mafê xwendekaran dikin û rewşa xewgeh û kêmasiyên din ên jiyana û xwendina xwendekaran dişopînin.

Lê li Zanîngeha Urmîyê ji bo hebûna du gelên Kurd û Azerî, hilbijartina han bi germ û gurriyek taybet birêve diçe. Ji ber astengên ku berpirsiyarên zanîngehê pêk tînin û destwerdana wan di nav hilbijartinan de û encamdana fend û fêlan, heta niha rê nehatiye dayîn Kurd deng bînin û bibin endamên wê Civata Senfî.

Berpirsên Zanîngeha Urmîyê hez nakin ku xwendekarên Kurd ji bo wê civatê deng bînin, lewra hewlê didin ku nûnerên hilbijartî Azerî û yê din bin, ne Kurd. Bê guman eva zilm û bêdaletiyêke eşkere ye ku li dijî xwendekarên Kurd li Urmîyê tê meşandin. Li hember vê zilm û bêdaletiya berpirsên zanîngehê, heta niha xwendekarên Kurd bi civîn û girevên nerazîbûnê, weşandina daxuyaniyan û wd... helwesta xwe li hember vê yekê nişan dane û nikarin bêdeng bimînin. Gireva nerazîbûnê a 4'ê vê mehê di çarçoveya wan xebat û çalakiyê şermezarkirinê de bûn ku xwendekarên Kurd lidar xistin.

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab



Dem Dema Guhartinê

Barack Obama, bi dirûşma "dem dema guhartinê ye", di hilbijartina 4'ê meha 11 ya Amerîka de pêşbazîya

Serokkomariyê qazanc kir û weke 44'mîn serokkomarê DYA û yekem serokkomarê ji esla xwe Afro-Amerîkî hate hilbijartin. Hilbijartina Obama ji aliyê aktorên siyasî û karbidestên dewletan ve bi hêvî û amancên cuda hate pêşwazîkirin. Lê gelo pilana guhartinê ya ku Obama her tim bas dikir û piştî serkevtinê hê pitir pêdagirî li ser kir, dê çend berfireh be û çî guhartinê bi xwe re bîne? Di wê navberê de hêviyên Komara Îslamî de çî lê bîn û pêwendiyên siberojê ên Îran û DYA'yê, dê ber bi kû ve herin?

Obama li pêvajoya pêşbazîya diyarîkirina berendamên hilbijartina serokkomariyê, pîr caran tekez dikir ku di nava her du partiyên xurt ên Amerîkayê, Demokrat û Komarîxwaz de kes û alî hene ku ji hin warên siyaseta her du aliyên nerazî ne. Ji aliyekî din ve di nava her du partiyên de kesên guhartinê xwaz hene ku partiyên tenê weke alavek siyasî ji bo gihîştin bi amancên ji partiyên mezintir temaşe dikin. Li gor wî, ji bo ku ew her du grûp bikaribin xwe di siyaseta nû a Amerîkayê de bibînin, divê ku sistemek nû ya birêveberiyê pêş bikeve ku rê bide xelkê, bêyî li berçavgirtina sînore navbera partiyên, di geşkirin û xurtkirina îdealên siyasî yê welat de beşdar bin.

Gelo ew awayê bîrkinê de serokkomarê Demokrat bîne ser wê qenaetê ku kevneşopîya siyasî ya sedsala dawî ya DYA'yê, biguhere û dijberên siyasî bîne bin sîwanek hevbeş? Tê gotin Obama di wê barê de ne dîre ku li ser şopa "Abraham Lincoln" (1809-1865)ê 16'mîn serokkomarê DYA bimeşe ku piştî serkevtina di şerê hundirîn ê li ser koledariyê, siyaseta lihevhatina neteweyî meşand û dijberên xwe jî anîn dika siyasatê. Qewl û qirarên hilbijartinê, hema hema siyasetek wiha bi ser Obama de ferz dîke. Diyarîkirina "Joe Biden" ji bo posta çîgiriye û îşaretên hindê ku renge "Hillary Clinton" berpirsiyariyek bilind di hukûmeta nû de bigire nîşaneyên wê çendê ne. Lê ji sînore pêşbirkêya hundirîn a nav partîya Demokrat bi der, tê pêşbînîkirin ku Obama hin kesayetiyên payeberz ên Komarîxwaz jî bixe nava karê xwe.

Şiyana bi tevgerkirinê ji aliyê Obama ve li dema hilbijartinê, ji bo gellek kesên ku tu hêvî nebûn rojekê bikarin bandorê li ser siyaseta DYA'yê danên, ew bawerî xurt kir ku ew jî dikarin di meydana siyasatê de hêza xwe nîşan bidin. Nîfşên ciwan, komên berfireh yê Afro-Amerîkayî, kesên ji Asiya û Amerîkaya Latîn û pîrî komelên din bersiv dan bangewaza Obama û beşdarî hilbijartinê bûn. Serokê nû dizane ku kesên ew hilbijartinê, îro

li benda pêgavên ku duh dirûşm jê re dihat dayîn in. Ew li bendê ne guhartinên ku Obama soz daye, beşek ji hêviyên wan bîne çî.

Di warê aborî de, lêgerên li ser rêya serokê nû hem pîrî in, hem bi zehmet. Kirîza cihanî ya aborî, bi pîlanên heya niha hatî pêşkêşkirin çareser nebûye û xuya ye dê bandorê li ser karê serokkomarê nû hebe. Hevdîtina Obama bi şewirmend û pisporên warê aborî nîşaneya girîngiya mijarê li cem serokê nû ye. Di wî warî de Obama daye xuyakirin ku dê girîngiyê bide rola dewletê di çavnihêrkirina pîlanên çareserîya kirîza aborî de. Ew pêngav, şeweyek nû ye ji bo kontrola kirîzên sermayedariyê. Dûr nîne ku ew rêbaz bibe reforma herî bingeşîna sermayedariyê, eger bê û navê şoreşa di hundir vegişîna sermayedariyê de lê neyê kirin.

Ji bo pîrîniya kesên ku ber bi pêşwazîya bangewaza guhartinê ya Obama ve hatin, aboriya nêz xelkê, kargehên biçûk, pişesaziya xwemalî û rewşa darayî a tak û malbatan girîng e. Serokê nû neçar e ji rêyên çareseriyê bigere heya jiyana wan bi miliyonan Amerîkayiyên mîaşgir ku bi metirsiya wê re rûbirû mane, kar û li pey re xanî û bingeha jiyana xwe ji dest bidin, hilneweşe. Ew erke pîrî giran e, lê di heman demê de dê bibe nîşaneyek ji şiyana mirov bo pîlandana û kontrola wan metirsiyên ku gefan ji jiyana ewleyî û ewlehiya mirovan û civakê dîke.

Kirîza aborî ya îsal a Amerîka û bandora wê bi ser aboriya cihanê nîşan da ku guhartinên Amerîkayê bixwaz in an na, bandorê li ser hemû cihanê datîne. Lewma serokê DYA'yê di heman demê de aktorê herî xurt û bi bandor ye siyaseta cihanî ye. Hem hevpeymanên rojavayî ên Amerîka û hem hevrikên cihanî yê wê, hemû li benda serxetên nû yê siyaseta derve ya serokê nû yê DYA'yê ne. Xurtkirina hebendiyên cihanî, bihêzkirina pêwendiyên bi Ewropa û welatên hevpeyman re, sererastkirina tîkiliyên bi Rûsya re, diyarkirina rêbaza nû a siyaseta li hember Çînê û arîşeya Îsraîl- Felsestîn, dê girîng bin. Lê wiha xûya dîke ku bidawîniya şerê li Îraq û Efxanistan û danûsitana bi dewletên ku li serdema "George Bush" weke "rêçika şerûdiyê" hatibûn binavkirin, ew yek ji lêgerên sereke yê siyaseta derve ya serokê nû be.

Obama hêvî dîke ku di nava 16 heyvan de leşkerê Amerîka li Îraqê vekêşe û li şerê dijî "El-Qayide" li Efxanistanê de guhartinekê li ser berjewendîya hêzên Amerîkayî pêk bîne. Li her du deveran dijberên Amerîka xurt in. Zêdekirina hejmara hêzên Amerîkayî li Efxanistanê renge wê girîmanê(ferz) zêde bike ku grûpên tundajo li Efxanistanê ber bi Keşmîr, Pakistan û komarên Asiyaya Navîn ve herin. Bi wî awayî dê hêviyê bi pêş bixin ku li meydana dijberîya bi DYA'yê û hevpeymanên herêmî yê Amerîka eniyek berfirehtir çê

bikin. Di demek wiha de metirsiya wê heye ku rewş li Pakistanê ji kontrolê biçê der. Ji aliyekî din ve dijberên Amerîka li Îraqê hêvî dikin ku sozên ku Obama danî û paşvekêşanek îhtimalî ji bo xurtkirina çîpêyê xwe bikar bînin. Îran bi rêya hevpeymanên xwe yê şîî û hêzên sunne bi piştgiriya welatên Erebi, li bendê ne rewşek wiha bo xurtkirina rola xwe di Îraqê de bikar bînin.

Lê Îran bi tenê di meydana siyaseta xwe ya derve de li benda paşvekêşîya Amerîkayê nîne. Tehran bi mîraq li benda guhartina siyaseta giştî ya Amerîka li hember xwe de ye û daxuyaniyên wan çend rojên dawî ên karbidestên rêjîmê jî wê yekê derdixin. Îran bêyî ku li bendê be di mijara pilana xwe ya navikî de an li desttêwêrdana herêmên berjewendiyên Amerîkayê guhartinekê nîşan bide, dixwaze ku rêveberîya nû a Waşingtonê deriyê diyalogê bi ser de veke. Di mesaja Ehmedînijad ya pîrozbahîya de ku ji Obama re birê kir, ew hêvî bi eşkere diyar bû.

Helwêsta serokkomarê nû her di heftiya yekem ya piştî hilbijartinê, hinek ew xewna karbidestên Komara Îslamî tal kir û tama şerbeta serkevtinê jê kire zuqum. Konferansa çapemeniya serokkomarê hilbijartî û helwêsta wî di derbarê çalakîyên navikî yê Îranê de tu guman neheşt ku birêveberîya nû a DYA'yê siyaseta xwe ya hember Komara Îslamî hin zû û zêde naguhere. Ji aliyekî din ve diyarîkirina endamê Congressê "Rahm Emanuel" (48) ji bo birêveberîya karûbarên Koşka Sipî, ku piştî posta serokkomar desthilata herî xurt e ji bo diyarîkirin rojeva serokkomar û birêveberîna kar û erkên rojane, hêj pitir Îran hêvîşkestî kir. "Emanuel" dostê xurt û bi bandor yê Îsraîlê ye û diyarîkirina wî tu guman neheşt ku bîngeha siyaseta DYA'yê derheqê rêjîma Komara Îslamî nayê guhartin. Lê renge taktîka danûstan û metoda berengarî bi Komara Îslamî re guhartinek wiha bi ser de bê ku hinek derfetê bide rêjîma Îranê daku rêbaza xwe biguhere.

Guhartinên ku tîrî çaverêkirin, çend bîngeşî bin wê dema pêşîya me nîşan bide. Ya girîng ew e ku çawa ew guhartinên rengeyî dê bandorê li ser tevgera rizgariya neteweyî li Kurdistan û qedera netewa Kurd danên. Serokkomarê nû yê DYA'yê hêj li ser rewşa Kurdistan û daxwaziya netewa Kurd helwêst negirtiye, lê daye xuyakirin ku alqirê diyalogê li navbera karbidestên Turkiyê û birêveberîya Herêma Başûrê Kurdistanê ye. Gelo ew îşaret dê bibe bîngehek ji bo helwêsta serokê nû li ser pîrsa Kurd li Rojhelata Navîn? Ji niha û pêve Koşka Sipî çî pîrsa Kurd bixe rojeva xwe, çî nexa, ya girîng ew e ku çar salên li pêşîya me dê ji Rojhilata Navîn û qedera gelê Kurd re çarenûssaz bin.

Prof. Kemal Mezher Tevî Dr. Cebar Qadir, Mamostayê Zanîngehê, Serdana PDK Îranê Kir

Roja yekşem, 08.11.2008'an, **Profesor Kemal Mezher**, dirokan û kesayetiye naskirî yê Kurd tevî **Dr. Cebar Qadir**, mamostayê zanîngehê, serdana Deftera



Siyasî a PDK Îranê kirin ku ji aliyê şandek ji Partiya Demokrat bi serokatiya **Mistefa Hicrî** ve bi germî hatin pêşwazîkirin.

Di hevdîtinê hana dostane de Dr. Mezher bas ji rêberên mezin yê Partiya Demokrat, şehîd **Dr. Qasimlo** û **Şerefkendi** kir û şanazî bi dostayetiya xwe tevî wan du rêberan kir.

Piştê Mistefa Hicrî, destxweşî ji xebat û xizmeta Dr. Kemal Mezher û Dr. Cebar Qadir bi diroka Kurd kir.

Li Buroya Kurdî Ya "Al"ê li Brukselê Semînarek Li Ser Rewşa Mafê Mirovan Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê Hate Lidarxistin

Roja yekşem, 09.11.2008'an, Bîroya Kurdî a Efûya Navneteweyî li Brukselê semînarek girîng lidar xist, li ser bangewaza Buroya Kurdî şandekê PDKÎ li wî welatî û her



wiha hejmarek berçav ji endamên partiyê di wê semînarê de beşdarî kirin. Semînara han ji bo "Emila Franka" Kurdînatora mafê mirovan li welatên Kendava Fars hatibû pêkanîn.

Di wê semînarê de, "Emila Franka" bal kişande ser rewşa xirab a mafê mirovan li Îranê, nemaze gelê Kurd û bi hûrî qala tund û tûjjiyên rejîma Komara Îslamî derheq çeleng û xebatkarên kurd kir û ev liv û kiryarên rayedarên rejîma Îranê hovane hesaband.

Wê xebat û têkoşîna gelê Kurd bona bidestxistina mafên rewşa û berheq ên xwe piroz binav kir û qala agahdarbûna wê rêxistinê derbarê zext û zordariyên rejîma Îslamî a Îranê bo ser neteweya Kurd di warên siyasî, aborî, civakî û çandî de kir.

Di wê semînarê de, Azad Hiwa berpirsiyarê beşa Pêwendiyên PDKÎ li Beljîkayê bona helwest û xebatên hêja ên "Emila Franka" derheq şopandîna rewşa mafê mirovan li Îran û Rojhilatê Kurdistanê spasîya wê kir û piştê wî jî bi berfirehî guhertinên vî dawiyê yê Kurdistana Îranê ji beşdarên semînarê re şîrove kir û li ser kar, kiryar û zext û zordariyên rejîma Îslamî ya Îranê li ser gelê Kurd sekîni û daxwaz kir ku raya giştî li hember rewşa bînpêkirina mafê Mirovan li Îran û Kurdistanê bêdeng û bêhelwest nemîne.

Şiroveya Peyvên Siyasî

Berhevkar: **Omîd Esxeran**
omid_anbi@yahoo.com



ÎGZÎSTANSIYALÎZM

Xwendingeha Îgzîstansiyalîzm li ser vê baweriyê ye ku di nav hemû canliberên cihanê de, berê divêt awa û çawaniya wan were liberçavgirtin. Bo mînak heke kesek bixwaze avahiyekê ava bike, divêt berê

çawanî û hilkevta avahiyê liberçav bigire û rewş û zirûfa vê çendê binirxîne û dûre dest bavêje avakirina avahî. Lê derheq meriv zirûf cuda ye. Çunku di nava mirovan de hebûn li jor naverokê ye û liv û tevgerên ku mirov di pêvajoya temenê xwe de dike, naveroka wî/ê pêk tînin û çawaniya hebûna wî/ê eşkere dikin. Girîngiya mirov di vê çendê de ye ku bi xwe ve tiştan çê bike û wan bidestve bîne. Mirovahî pêkhatî ye ji wan liv û tevgeran ku hevdem tevî mirov hebûne û ji bilî vê çendê tu wateyek din nîne. Bi vî awayî berpirsiyariya me hemûyan di civakê de, gellek girîngtir ji vê çendê ye ku em lê difikirin. Çunku berpirsiyariya her yek ji me tim cîhana mirovahiyê bixwe ve digire û di hemû karan de em ne tenê li hember xwe berpirsiyar in, belku berpirsiyariya hemû takekesan dikeve stûyê me. Mirov bi liv û tevgerên xwe, rewşekê ji bo mirov pêk tîne ku wî/ê bixwe hilbijartîye. Bi gotinek din bi hilbijartina rêya ku em digirin pêşîya xwe, em rêya hemû mirovan hildibijêrin.

"Jan Pol Sarter" ku weke yek ji aîgirên tund yê xwendingeha han tê hesabandin, dibêje: "Nigeraniya mirov di vê çendê de ye ku ne tenê ew rê û rêbaza jiyana xwe hildibijêre, belku yasadaneke e ku bi hilbijartina xwe, yasayekê ji bo civaka mirovahiyê hildibijêre, ger wiha bû ew nikare xwe ji berpirsiyariyên ku ketine ser stûyê wî/ê veşêre û divêt di hemû karan de tirs û nigeranî hebe".

Îgzîstansiyalîzm piştî şerê duyem ê cihanî bi awayên cur bi cur berfireh bû. Di rastî de take tiştê ku hêjayî xistine rojevê be, rohnkirina awayên ruhî ên mirov e ku bi vî awayî em dikarin Îgzîstansiyalîzmê weke xwendingehêk Îdealîst bihesibînin.

Îzîstans yan jî hebûn ku weke bingeha têgiha Îgzîstansiyalîzmê tê hesabandin, lêkolînê ser aliyê cur bi cur ên jiyana mirov dike.

Îgzîstansiyalîst li ser vê hizrê ne ku mirov di jiyana rojane a xwe de, canliberek bê kesayeti yê ku seh bi hebûnê nake. Lê ji ber tîrsa ku ji mirin û bêwatebûna jiyane heye, hest bi hebûna xwe dike.

Çunku xwendingeha Îgzîstansiyalîzmê lêkolînê li ser awayên ruhî dike û diyardeya hebûnê tevî peyva derveyî hestê girê dide, bi neçarî di çarçoveya hizra Îdealîstî de çî digire û ji aliyê Marksîstan ve nahê pesendkirin.

**Çavkanî: (Fehengî Ramiyarî Nîga) Azad
Weledbegî
(Danêşnamêyê Siyasî) "Political Dictionary"
Daryûş Aşorî**

Diyardeyek Bi Navê Helatina Mêjiyan

Hemîd Muxtarî
hemid83@yahoo.com

Diyardeya helatina mêjiyan yan revîna mirovên pispor û xwedî şiyar ji welatên cîhana sêyem, fenomen (vetîr)ek nû ye. Belku welatên cîhana sêyem nîva sedsalekê ye ku ji dest vê fenomenê de dinalin. Salane bi milyonan kes bona domandina xwendinê û bi hêviya gihîştin bi jiyaneke baştir koçberî welatên pêşkevî dibin.

Bi raya xesarnasên civakî, helatina mêjiyan ji welatên cîhana sêyem weke yekemîn kirîza civakî tê hesêb.

Îran jî yek ji wan welatan tê hesabandin ku çendî sal e tûşî vê diyardeya civakî hatiye. Îran di warê revîna mêjiyan di nava 91 welatên cîhanê ên nepêşkevî û welatên di halê pêşdeçûnê de, xwediyê pileya yekem e. Li gor rapora **Sindoqa Navnetewî A Pere**, her salê pitir ji 150 heya 180 hezar kes ji kesayetiyan xwendewar ji Îranê koç dikin. Di sala 2000'an de, bi terzekî navincî rojane 15 kesên xwedî belge-nameya karnasiya bilind welatê Îranê bi cî hêlane. Di sala 1999'an de, 5 hezar a 475 kes ji karnasên Îranî terka welatê xwe kirine. Herwiha di navbera salên 1990'an heya 2000'an de, 151 kes ji endamên Girûpên Zanistî ên Zanîngehên Îranê çûne derveyî welat û nevegeriyane. Niha hejmara gişt mamostayên zanîngehan li seranserê Îranê 1500 kes in. Di helakê de ku hejmara profesorên Îranî ên derveyî welat pitir ji 400 kesan e û 5 hezar kes ji Îranîyên akinciyê Amerîkayê xwediyê pileya doxtorayê ne. Ji encama revîna mêjiyan ji Îranê bo welatên din, salane 40 milyar dolar derbeya aborî ji welatê me dikeve. Tenê ji koça Îraniyan bo welatê Amerîkayê, salane 12 milyar dolar derbeya aborî ji welatê me dikeve.

Diyardeya helatina mêjiyan ji Îranê roj bi

roj berfirehtir dibe û ew kesên pispor, zanyar û xwendekar ku di rastî de divêt xizmet bi netewa xwe bikin, ber bi welatên biyanî koç dikin. Heya niha ne berpirsên Wezareta Zanist a Îranê û ne desthilatdarên vê rejîmê nekarîne yan nexwestine ku tu çareseriyekê bona pêşgirtin ji xurtbûna vê diyardeyê peyda bikin.

Mêjiyên ku divêt di xizmeta pêşkevîna welat û xelkê xwe de bin, niha em dibînin ku di welatên dût ji Îranê xizmetê dikin. Gellek caran em di dezgehên ragihandinên cîhanî de dibînin û dibihîsin ku dibêjin: "Bijardeyên Îranî di kêberkêyên zanistî di asta cîhanî de pileya yekem bi dest xistine û bûne cihê şanaziyê ji bo welat û xelkê Îranê. Lê di rastî de serkevîna wan bo xelkê Îranê tenê rûmetek e û bes. Renge bi qasî çend rojan ragihandinên cîhanê bas ji wan bike, lê di rastî de welatek serkevîtiye ku bikaribe wan kesan ber bi aliyê xwe ve rabikişîne.

Di encama helatina mêjiyan de, gellek xesarên aborî, civakî, zanistî û çandî rastî xelkê me hatiye û çareserkirina wan ji bo welatê me pirr zehmet û giran e.

Welatên Amerîka û Kanadayê bona rakêşandina bijardeyên zanistî yê Îranî bo aliyê xwe ve û dabînkirina îmkatên rehetî û aborî bo wan di pileya yekem û duyem de ne. Li gor serhejmarîyan, 3 milyon kes ji hevvelatiyên Îranî koçberî welatên cîhanê bûne. Di nava vê hejmarê de, 2 milyon kes di Amerîkayê de ne, 200 hezar kes li Kanadayê, 180 hezar kes li Îngilîstanê, 110 hezar kes li Almaniyayê, 100 hezar kes ji wan li Fîransayê, 90 hezar kes li Swêdê, 70 hezar kes jî li Usturalayê û yê mayî jî di welatên din de akincî ne.

Di encama lêkolîna lêkolînavanekî Amerîkayî di zanîngeha "MIT" de, pitir ji %45 ji Îranîyên akinciyê Amerîkayê xwediyê belge-nameyên karnasî û karnasiya bilind in. Herwiha li gor lêkolînên ku di asta

zanîngehên Îranê de hatine encamdan, bi awayekî navincî tenê 3 kes ji 18 kesên ku ji aliyê xwendegehên Îranî ve bona domandina xwendinê ber bi welatên din tîr şandin, vedigerine welatê xwe.

Bê şik yek ji sedemên helatina **sermayeyên mirovî** ên civaka Îranê, nebûna ewlehî û birêvebirina siyasetên şaş ji aliyê desthilatdarên rejîma Komara Îslamî li Îranê ye.

Mixabin herdem li Îranê seba desthilatdariya sîstemên nedemokratîk, xelk ji azadî û heta hebûna jiyaneke navincî, bêpar bûne. Nebûna ewlehiya canî û karî, nebûna azadiyên raman, takekesî û çandî,



giringî nedana desthilatdarên rejîmê bi zanist û pêşkevîna, bêkarî, newekhevî û pêkanîna zext û givaşan bo ser jinan di civakê û zanîngehan de, xirabbûna rewşa aborî û... yê bûye sebeb ku gellek mirovên pispor û ciwanên bi şiyar û sermayeyên civaka Îranê welatê xwe bi cî bihêlin.

Îro rojê heta welatên weke Turkiye, Erebestana Seûdî û Kuweyt jî ê bûne nîçîrvanên mêjiyên Îranî!!

Helatina mêjiyan li destpêka serkevîna şoreşa xelkê Îranê di sala 1979'an de û bi taybetî di pêvajoya bi nav Şoreşa Çandî û piştî axavtina Xumeynî, bi terzek berfirehtir dest pê kir.

Xumeynî di axavtina xwe de derheq revîna mêjiyan ji Îranê got: "Dujmin û opozîsyonên rejîma Îslamî dibêjin, li Îranê gellek mirovên xwedî zanist, pispor û şareza koçberî welatên Rojavayî dibin, bi cehenem ku diçin. Ew xwendekarên çûyî ên ku her bas ji zanist û çanda welatên Rojavayî dikirin, bila herin. Me tu hewcehî bi zanist û zaniyariyên Rojavayîyan nîne. Ger hûn jî dizanin ku vira cihê we nîne, bi cî bihêlin û herin. Rêya we vekirî ye!!"

Divêt bê gotin ku piraniya kirîz û xesarên civaka me di encama nebûna azadî û wekhevîyê de pêk tîr. Azadî kesayetiye dide gişt takên civakê. Dema ku azadî û demokrasî hebe dewletên ku ji rêya dengê xelkê ve tîr ser kar, xwe li hember xelk û welatê xwe bi berpirsiyar dizanin û armaca wan tenê û tenê xizmetkirin bi welat û xelkê xwe dibe. Di sîstemek azad de berpirsên dewletê hewlê didin ku welatê xwe di warê zanistî, aborî, çandî, civakî û... ber bi pêş bibin. Lewra heya azadî û demokrasî nebe, jiyar bi wateya rastîne ya xwe tu nabe.





Rapora Wêneyî Ya Zarokên Karker Di Kûrexaneyan De

Ajansa Nûçeyan a "MEHR" heftiya borî çend wêne ji zarokên gundê Husênava ya ser bi bajarê Serwava derdora bajarê Sine belav kir ku neçar

in ji ber karkirina malbatên xwe di kûrexaneyên kelpîçan de bijîn û bixebitin ku dîmenek xembar li jiyana wan di bîr û raman mirov de çê dike. Jiyanek dijwar û dûr ji cîhana zaroktiyê mafên destpêkî ên zarokan û bepêarbûn ji xwendin, perwerdehî û jiyana bi ewle û wd...

Her çiqas li gor biryar û qanûnên Îranê, karkirina zarokên jêr temenê 15 saliyê qedexe hatiye kirin, lê zarokên kurd ên gundê Husênava bi destên biçûk ên xwe û tevî dayîk û bavê xwe ji bo debara jiyana ji serê sibê heta şevê bi qaliban kelpîçan lê didin....



Wêne: Ajansa "MEHR"

Rojeva Civakê

Serhejmariyên Derheq Teqîna
Mayînan Nahên Ragihandin

Di Rojê De 2/5 Kes Bi Sedema Teqîna Mayînan Jiyana Xwe Ji Dest Didin

Agirî- Beşa Civakî

► Mayînan dijminên herî bixeter û cihê tirsê yê mirovan in ku berdeham û li her cihê gefê li jiyana mirovan dikin. Li gor raporên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, salane hezaran mirov ji ber teqîna mayînan jiyana xwe ji dest didin an siqet û nivîşkan dibin û di her warekê de jiyana ji wan tal û nexweş dibe.

Li Rojhilatê Kurdistanê, di salê de saden mirov bi sedema teqîna mayînan jiyana xwe ji dest didin yan bi xurtî birîndar dibin.

Her çiqas serhejmariya rast û eseh derbarê teqîna mayînan ji aliyê rêveberên Komara Îslamî nahê weşandin, lê vê dawiyê **Sureya Ezîzpenah**, Rêvebera Civata Jiholêrakirina Mayînan got: "Rojane 2/5 mirov ji ber teqîna mayînan li Îranê jiyana xwe ji dest didin ku hejmarek berçav ji wan zarok in:". Wê anî ziman, Her çiqas serhejmariyek rast û eseh li ser goriyên teqîna mayînan li Îranê tune ye, lê li gor lêkolînên dawîn, ji sala 1988 heta 2003'an, bêtiirî 16 hezar zarok li Îranê bi sedema teqîna mayînan rastî mirin an birîndarbûna xurt hatine.

Wê berpirsiyarê got: "Di vê heyama ku qala wê hate kirin, 348 zarokên bin temen 15 saliyê li Parêzgeha Kurdistanê, 131 kes li Îlamê, 246 kes li Kirmaşanê, 137 kes li Xozistanê û 147 kes jî li Azerbaycana Rojava(Urmiye) rastî mirin û birîndarbûnê hatine.

Wek tê xuyakirin, her 4 parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê, di nava 7 parêzgehên Îranê cih girtine ku herî zêde mayînen neteqiyayî û herî zêde jî goriyên mayînan hene.

Sureya Ezîzpenah ragihand ku di vê heyamê de, hejmara zarokên goriyên mayînan ên navbera temenê 15-19 saliyê bi vî awayî ye: 158 kes li Parêzgeha Kurdistanê, 108 kes li Îlamê, 211 kes li Kirmaşanê, 93 kes li Xozistanê û 76 kes li Azerbaycana Rojava jiyana xwe ji dest dane û birîndar bûne.

Wê got ku dezgeh û organên Komara Îslamî, serhejmariyên rast û eseh derheq teqîna mayînan divesêrin. Tê texmînkirin ku 16 milyon mayînen neteqiyayî di encama şerê 8 salî yê navbera Îran û Îraqê de hêj bi cî mane ku herî zêde li 4 parêzgehên Kurdan hilketine.

KED Û JIN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Di destpêka eçiqandin û jêxwarina mirov a bi destê mirov de, yanê di bingeha têkildariya serdestî û bindestiyê de, rastîniya talankirina

kedê û bidûrxistina ji hilberiyê, heye. Ku mirov li ku an bi çi awayî ji keda xwe hatibe bidûrxistin, bi heman awayî li wir ji rûmet û azadiya xwe jî tê bidûrxistin. Belê ev ked keda kê ye?

Bêguman, keda jinê ye. Ji herdu hêmanên jênager ên mirovbûna mirov yek jê hêmana jinê ye. Mirovahiya dinê bi mêtîngehkirina jinê re azadiya xwe jî dest daye. Taybetî û hilberîneriya cestî (bedenî) ya jinê û zayenda wê ya pîroz, bi xwezayî bûbû sedema dayikatî û pêvegirêdana mal û zarokan û bindestiya mêrê serdest û bavkanî. Di heman katê de, jin hem jî qada kedê hate bidûrxistin û hem jî vîn û jiyana xwe ya azad û serbixwe ji dest xwe berda. Êdî jin ji aliyê hemû hêzên serdest de hate hecinandin û di kesayetiya wê de, mirovahî hate bînpêkirin. Ew roj û ew roj e ku mirovahî bi ser xwe ve nehatiye.

Gelo pêkan e ku dayik, hevser (jin) û keça mirov wekî mirov neyên dîtin; mirov bikaribe bi emrê xwe şa bibe? Na! Çimkî heta ku jin -bi ser wê dayikatiya xwe- li şûna ku kêma û hewcedar tê dîtin, bi her awayî wekî mêr neyê dîtin û azadiya xwe bi destê xwe -belê bi piştevanî û alîkariya mêrê çê û azadixwaz- neafirîne, ne gengaz e ku ne mêr ne jin û ne jî mirovahî bi jiyana, aştî û azadiyê şa bibe. Divê ku jin û mêr herdu jî li cihê ku ked û azadiya jinê lê winda bûye vegerin û ji wir dest bi kar û hewldanên rûmetgiriya kedê û jinê bikin. Dîsa divê ku jin û mêr li nik hev, belê bi hevkarî û alîkarî tevbigerin. Divê ku pêşî nîrxê bidin keda jinê qey ku dikaribin rûmet, serbilindiyê û yeksaniyê gerdûnî bidest bixin. Dê tenê bi vî awayî dikaribin herdu hêmanên mirovahiyê bigihînin hevdu. Bêguman girêdayî vê yekê de mirovahî jî geşedaniya xwe ya xwezayî û mirovî temam bike û bigihêje lûtkeya şarezahiya nûjen, hemdem û pêşverû.

Çawa ku tevger û rêxistinên ku di her warî û her qadê de peywira xwe ya dîrokî listine/dilzîn, bi heman awayî ji hêla pîrsgirêka jinê de jî -ku pîrsgirêka tev mirovahiyê ye- gellek rûdan, pêşveçûn û serkeftinên bêhempa bidest xistine. Carekê damezrîner û avahîsaziyê (mîmarê) tevger û rêxistinên demokratîk

û şoreşgerî, her gav azadiya mirovahiyê bi azadiya jinê ve girê didin û dibêjin "Heta ku jin azad nebe mirov û mirovahî azad nabe. Heta ku mirov azad nebe jî mirovahî û cîhan azad nabe" Rast e. Îro ro, sê pîrsgirêkên mirovahiyê yên bingehîn yên gerdûnî (navneteweyî) hene. Ev hersê pîrsgirêk jî ji ber pîrsgirêka kedê (kedxwariyê), bi taybetî jî keda jinê, derketine holê û her wiha hersê jî bi hev û din ve girêdayî ne. Yek; pîrsgirêka zayendî. Du; pîrsgirêka çînî. Sê; pîrsgirêka neteweyî. Belê ji nav van hersê pîrsgirêkan a mezintirîn û girîngtirîn pîrsgirêka zayendî ye. Lewre di bingeha herdu pîrsgirêkên dawî de pîrsgirêka zayendî, ango pîrsgirêka jinê heye. Heke ku jin wekî mirov ji aliyê mêr û hêzên serdest de, ji ber zayenda xwe nehatiye mêtin, tucar serdestî û bindestî û girêdayî wê çin, welat û neteweyên mêtîngeh û pergalên mêtînger pêk nedihatin. Pêşî, bi jêbidûrxistina hilberiyê û peyre jî bi talankirina keda jinê re zêdebarî û girêdayî wê, kalêr û sermiyan derkete holê. Jin, tevî zêç û zarokên xwe li malê bazirganiyê dageriya. Îro jî tê de, di her dêman û civakên çînî de, jin her tim wekî alaveke mêtîne hatiye/tê dîtin û xebitandin. Ev yek bi serê xwe, rûreşî û bextreşî ye ji bo mirovahiyê. Hewce nîn e ku mirov ji nû ve rabe hemû civakên çînî yên dîrokî ji serî heta dawî dahûrîne û li ser rewşa jinê lêgerîne bike. Her tişt li ber çavan ne. Di mercên îroyîn de jî, jin bi gelemperî belê di karvaniya jiyana hê biqasî çaryeka mêr jî nayê dîtin. Ev yek jî rewşa mirovahiyê û feraseta azadî û aştîya cîhanê ya îroyîn li ber çavan radixe. Heke ku jin, di domana dîrokî ya îroyîn de, li keda xwe xwedî derbîkeve û rola xwe ya dîrokî bilîze, dê nîrx û hêjhiyên bêhempa bidest bixe û pêşkêşî nîfşê nû û mirovahiya cîhanê bike. Dê ev yek bibe ronîsansa jinê. Û bibe ronîdariya (ronesansa) serdema 21'ê.

Ronesansa serdema 21'ê de pêşîya dahatûya jinê û girêdayî wê jî dahatûya nîfşên bê ronî bike Yanê vejî û tevgera jinê, de bibe sedema hilweşandina sazûmanên împeryalist û mêtînger jî. Bi kurtayî, vejîna tevgera jinê de bibe sedema vejîna tevgera mirovahiyê cîhanê û her wisa de bibe sedema jiyana û cîhanê nûjen, yeksan, aştîyane û azad jî.

Kaniya Helbestan

Bextewerî



Jîla Husênî

Min hewil dida
te binasim
û bidim nasîn
Gopalê hesin di destê min de
kolan, gund û şar neman
li şopa te geriyam
kes nebû navnîşana te bide
min
Min deşt û çol û çiya birrîn
min tu her nedîtî
Min zeryayên xwe
bi henaseyên agirgirtî
kir hilm
û min hîç te nedît
Xembar, westiyayî
dil mişt ji azar
ji xemên hejaran
û birînên laşên birîndaran
Hûr hûr min nêrî
bi min pêkenîn
"bextewerî?!"
ewa ku tu li dû wê digerî
zarokek bû
çawa ji dayik bû
serî birrîn"

Ji pirtûka 'MIRINA ROJÊ' hatiye wergirtin. Helbestvan Dilşa Yusuf ji Soranî bo Kurmancî wergernadiye. Weşanxaneya Avesta

Her Kes Bi Zimanê Dagirkeran Biaxive, Wek Ewan Difikire

Azad Makû - Tehran

Para ziman di gişt aliyên mafên mirovan, pêşketina neteweyî, têkildarî û ramyariya têkildarî, perwerde, çêkirina saziyên ramyarî,

beşdariya siyasî, ji holê rakirina mêtîngerî, di çêkirina rêya nû ya aboriya navneteweyî de gellekî girîng e, lê nenas maye".

H. Tonkin

Di vê nivîsarê de hin tiştên balkêş hene, para ziman di rakirina mêtîngerî, tekildarî û hwd.... Wekî em baş dizanin, îro welatê me hatiye dagirkirin, mafên mirovan ji bo me nayên rêzgirtin, parastin û em tîn perçiqandin.

Em nikarin pêşketinek neteweyî çê bikin, roj bi roj bi awayên cuda li ser rîya vê pêşketinê asteng û keviran datînin, tekiliyên me kurdan bi hevdu ra ne xurt in, beşdariya siyasî a me ji bo doza Kurdistanê di qadên navçeyî û navneteweyî da ne xurt e, em dixwazin mêtîngeran ji axa xwe derxînin, lê hêj em ser neketine, aboriya me pirr qels e, em nikarin bi zimanê xwe perwerde bin.... Sebebên vê pirsgerîkê gellek in, lê bi ziman re jî giredayî ne. Çawan?

Ziman fikir bi xwe ye. Yanê em her çî tînin ser zimên, ji fakir û hizra me tê. Hizr ji zimên cuda nîne. Em pirranî di nivîsar û axaftinên xwe, di parastina mafên mirovan, di hewildanên ji bo pêşketina neteweyî, di tekiliyên xwe bi hevdu re, ramyarî, perwerde, dibistan û zanîngehan de, di xebat, şer, sazî, partî, rêberî, çalakiyên xwe li dijî mêtîngeran de, di bazirganî, xebatên aboriya xwe de zimanên serdest û dagirkeran bi kar tînin. Yanî li ser van mijaran wek serdest û dagirkeran difikirin, bê ku em bixwe bizanibin û haya me jê hebe.

Em doza serxwebûnê dikin, berxwedanê dikin, nivîsaran dinivîsin, rêberiyê dikin, şervanî û dostaniyê dikin, lê pirranî bi zimanên dagirkeran. Ev dibe sebeb ku jiyana me, xewnên me, çalakiyên me, wek yê dagirkeran bin.

Li gorî zimannasan, îro sedsala Emperyalîzma zimanî ye. Ev mijar bi cih e û nîşana girîngiya para ziman di qada malbat, civak, netewe, navçe û navnetewî de ye. Dinya ber bi gerdûnbûnê ve diçe, sînor tîn rakirin, qadên kêbirkêyan berfireh dibin. Di warê ziman de jî ev qad mezintir dibe, yanî zimanê herî xurt ser dikevin û yê qels û hejar tîn perçiqandin.

Di qada navnetewî de zimanên înglîzî, fransî, îspanyolî û ... serdest in. Di navçeya Rojhilata Navîn de farsî, erebî û turkî bûne lîstikvan. Lê kurdî? Tenê di Başûr de peşkek meydana dane kurdî, lê di wir de cihê kuramancî vala ye. Yanê vala hiştine û dixwazin ji holê rakin. Di vê derbarê de, divê em bale bidin ku helwesta li hember Kurmancî new eke dijîmanan be. Pêşî li perwerdeya kurmancî tê girtin, vê çendê li

ser Rojhilat jî bandor daniye, di TV'ya Seher li Îranê de jî beşa kurmancî rakirin û para Radyoyê jî kêr kirin ...

Em divê hişyar bin, îro di gorê de dengên Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî tê, ku diqirin, dengên wan diçe perrên esman û gellek siyasatvan, ronakbîr, rêberên kurd şermezar dikin û dibêjin: "Lawo bela we ji Xwedê bê, hûn çima bûne dijîmanê zimanê xwe?".

Rastî çima em ev qas dijîmanê zimanê xwe ne? Ev rewşa dê heta kengê bidome? Em îro ev qas qels û belengaz tîn dîtin ku hevdu napejirînin.

Bê hebûna ziman mirov nikare ji hebûna netewe biaxive. Ev yek li ser kurdan rast e. Lê pirraniya kurdan bixwe zimanê xwe baş nizanin û bi kar nînin. Pirraniya nivîskar, ronakbîr, rojnemevan û siyasatvanên kurd zimanên mêtîngeran dixebitînin.

Di nav ziman û nasname de pêwendiyek xurt û gellekî nêzik heye. Ew bingeha pênasa me ye. Pêwistiyek ji bo her gelî ye. Em divê bi kurdî xeber bidin, bi kurdî xewnan bibînin, bi kurdî binivîsin, bi kurdî guhdarî bikin, bi kurdî hizir bikin, bi kurdî rabin û rûnin, bi kurdî bijî.

Heya dema ku em doza kurdîyê bi zimanên serdestan bikin, ew jî dê di dilê xwe da me bikenin û me cidî negirin.

Ziman wekî werîs û kindirêkê ye ku em bingeha gelbûnê ve girê dane, heke ev yek biqete, em ê wek gemiyekê bibin ku di vê xwedî di nav pêlên deryayeka tofanî de sergirdan e û zû yan dereng dê bixendiqe. Kurdî awayê têgihîştina me ji hawîrdora me ye.

Her kurdek ku zimanê xwe nepeyive, xwe dixapîne. Erka ser milên dayikan di vê holê de girîng û mezin e. Divê bi zarokên xwe re zimanê zikmakî biaxifin. Kurdî stûna hebûna me ye.

Zimanê me dewlemend e. Em bixwe lê xwedî dernakevin. Em jî sûçdar in. Kurdî ji turkî û farsî xurttir e, ev rastiyek zanistî ye. Wek belge: Di sala 2008'an di Kovara fransî ya "le francais dans le monde" (zimanê fransî di gerdûnê da), hejmara 355 de, "Louis Jean Calvet" zimannasê navdar, piştî heft sal lêkolîn, encama wê weşand. Di vê lêkolînê de, 88 zimanên herî girîng yê gerdûnê diyar dike.

Di wê de rêza înglîzî 1'em, fransî 2'em, erebî 7'em, turkî 26'em, **kurdî 31'em**, farsî 40'em, azerî 47'em e.

Tistê balkeş ev e: salan e kurdî tê perçiqandin, lê dîsan rewşa wê ji zimanên dagirkeran baştir e. Ev yek cihê şanaziyê ye. Loma, werin em bi hev re peymanê girê bidin zimanê xwe biparêzin.

Wezaretê Çand Ya Komara Îslamî A Îranê Nahêle Pirtûka 'Rêzmana Kurdî Ya Kurmancî' Çap Bibe

Wezaretê Çand û Rênişaniya Îslamî a Komara Îslamî ya Îranê nehêla Pirtûka 'Rêzmana Kurdî ya

Kurmancî' bê çapkirin. Pirtûka ku ji aliyê Profesor û Nivîskara Fransî "**Joyce Blau**" û **Veysi Barak** ve bi Fransîzî hatiye nivîsîn û ciwanê Kurd yê bajarê Makûyê, **Elî Belxkanlû** bi Farsî wergernadiye.

Pirtûka 'Rêzmana Kurdî ya Kurmancî' bi hûrî û berfirehî mijarên bingeîn yê Kurmancî dide nîşandan ku ji bo hînbûna Kurdên ku rêzmana Kurdî a Kurmancî nazanin, gellek bi feyde ye. Wergêrê law, Elî Belxkanlû şîroveyên pirtûkê bi Farsî wergernadine, lê hevok û mînakên wê bi Kurmancîyê latînî ne.

Li gor qanûnên Komara Îslamî a Îranê, divê pirtûk bona çap û belavbûnê ji Wezaretê Çandê re bîn şandin heta ku rê bidin çap bibe. Ev kar li wê wezaretê rejîma Îslamî li Îranê salek kişand, bi awayekê ku wergêr ji hatin û çûnê westiyabû.

Di dawiyê de, berpirsiyarê giştî yê beşa çapa pirtûka di Wezaretê Çanda Îranê, Dr. Hemîdzade ji Elî Belxkanlû re dibêje: "Di naveroka wê de tu tiştê li dijî siyasat û Îslamiyê tune ye, lê ji ber ku kurdî

Rêzimanê Kurdî ya kurmancî

Nivîskar : Joys Blo û Veysi Barak

Wergêr : Elî Belxkanlû

2008
Tehran

zimanekî Îranî ye, divê bi alfabe ya farisî bê nivîsîn, ne latînî".

Ji ber ku pirtûka 'Rêzmana Kurdî ya Kurmancî' bi alfabe ya Kurdî a latînî bû, belgeya/destûra çapa wê nedan û li Îranê nahê çapkirin.

Hêjayî gotinê ye, li Îranê mixabin heya niha tu pirtûkek li ser zaravê kurmancî nehatiye nivîsandin an jî çapkirin. Eva yekemîn pirtûk û wergêr e ku bi Kurmancî hatiye berhevkirin. Bi vê hêviyê ku Kurd lê xwedî derkevin.

Azad Maku – Rojhilat

Rêgirtin Ji Vekirina Fêrgehêk Zimanê Kurdî Li Qurwê De

Li gor nûçeyê Nûçegihaniya Rêxistina Mafên Mirovan li Kurdistanê, navendeke fêrkirina zimanê Kurdî li



bajarê Qurwe di meha Gelawêja îsal de ji aliyê îdareya "Emakin" a wî bajarî bi hinceta nebûna derfetnameya çalakîyên perwerdeyî hate daxistin.

Berpirsiyarên vê fêrgehê ku bi nûneratiya fermî li navenda Soma ya Mehabadê û bi girtina derfetnameyê ji Şewra bajarê Qurwê li Sermaweza 1385'ê ve çalakîyên fermî yên xwe dest pê kiribû, di çend mehên borî de berdewam serî li îdareya "Emakin" û "Îrşad" a bajarê Qurwê xistine, lê hêj berpirsiyarên vê îdareyê izn û moleta vekirina vê fêrgehê nedane.

Xanima **Xatûn Hebîbî** nûnera navenda çandî – perwerdî ya Soma ya li bajarê Qurwê û berpirsa fêrgeha zimanê Kurdî di vî bajarî de, got: Sedemên nedana moletê bo vekirina vê fêrgehê ji aliyê berpirsiyarên îdareya "Îrşad" ve, vedigere ser selbûna (nezewicîna) min wekî berpirsiyar û mamostaya zimanê kurdî û herweha neguncawbûna rişteya xwendina min tevî darsa zimanê Kurdî û ewana wekî nimûne bo nebûna kêrhatîbûna min destnîşan kirin. Herweha Xatûn Hebîbî daye zanîn ku di destpêka daxistina polên dersgotinê de, cihê dibistanê kirne hêcet bo nebûna îcaznameya çalakiya perwerdehiyê. Wê ji wan re gotibû ku amade ne cihê fêrgehê biguherin.

Xatûn Hebîbî serî li navendên pêwendîdar di navenda Parêzgehê de xist û tekez li ser vekirina polên dersgotina bi zimanê kurdî kiriye û ji ber hêcet û behanegirtina sedemên siyasî yan exlaqî bona daxistina vê fêrgehê, rexne ji berpirsan girt.

Hêjayî gotinê ye ku di bajarê Qurwê de bi sedema teitîlkirina NGO'an û navendên edebî bi hêcetên curbicur, niha di vî bajarî de rêxistinên edebî, civakî û çandî çalak nînin.

Dengê Rojava

Çanda Bi Axa Xwe Ve Girêdayî

Besam Mistefa



Çand di zimanê kurdî de ji çandiniyê tê, bi wateya tiştê ku di mêjiyan de li

dirêjahiya hezar salan hatiye çandin û bûye kultûreke taybet ji gel û milletan re. Her weha, çand wateyeke xwe ya girêdayî pêşerojê jî heye, anku ew proseyek berdewam e û tê dewlemendkirin, em dikarin bêjin roj bi roj.

Weke hemû netewe û milletên navçeya me ya Rojhilata Navîn, kurd jî xwedî çandêke taybet û balkêş in. Çand girêdayî jiyane bi xwe ye. Jiyane jî - dût ji ramanên nijadperest û li gora gellek belge û dokumentên dîrokî - li ser axa Mezopotamiyayê hatiye destpêkirin. Jiyana mirovan bi rengên xwe yên pêşîn li Mezopotamiyayê rû daye û curên çandinî û xwedîkirina sewal û dewaran bi destê akinciyên wê deverê dest pê bûye û ji wira berbelavî seranserê cîhanê bûye.

Rojhilat ciyê peyamên pîroz û olên asmanî û muzîka pêşîn û çand û hunerê ye. Ji demên kevin de hunerên cuda-cuda û çand û kultûrên ruhanî li rojhilatê dest pê kiriye. Çand û hunerên li devera navbera herdu çeman de – Dicle û Firatê - ji demên kevin de bi nav û deng bûne û heta niho jî li Rojavayê bi coş û lezzetêke pîrr mezin tene şopandin û mêzandinê. Em ne şaş in, dema ku em bêjin axa di navbera herdu çeman de bûye weke kaniya çand û hunerên rengereng.

Li heman deverê, ji berê ve ev ax bûye hembêzkera çanda olî, îlahiyat û ilm û îrfanê. Ol, ayîn li rojhilatê hatine zayînê. Bi hezaran alim û xwedî terîqet û mezheban li vira çêbûne û heta niho hêj rê û rêçikên wan berdewam in û ji aliyê gellek kesan ve tene şopandin. Eger li rojava teknoloji pêş ketiye, lê belê tiştê giringtir, anku can, giyanê mirovan ava jiyana xwe ji rojhilat digirin.

Di cîhanê de, çi ziman, çand û kultûr û edebiyat hebe li ser axa xwe şîn dibe, û bi koka xwe ve tê girêdanê. Çandêke bê ax û dûtî axa xwe nikare bipîşkive, nikare şîn bibe û bipêş bikeve. Me got çand ji çandiniyê hatiye, bêyî koka xwe û ne di nêv axa de îmkân tune ye ku dara çandêke gul vede û ber bigire.

Mirov, ku çand bi wî ji bona wî ye, eger dûtî kok û axa xwe bikeve, diçilmise. Çanda mirov jî ku bêhna axa wî jê neyê, dûtî resenetiya xwe dikeve û bê çêj û nasname dibe. Ji xwe nivîsandin bi giştî û çand ewe mirov ji xwe, ji axa xwe, ji taxa xwe, ji kolanên xwe û toza wan dûtî nekeve. Cîhanîbûn qet nayê wê wateyê ku mirov dûtî doz û pirsgirêkên hawîrdora xwe bikeve û berê xwe bide pirsgirêkên cîhanî! Cîhanîbûn ne ew e ku mirov dûtî axa xwe bikeve!

Zimanê milletan û mentalîteya wan çavkaniya xwe ji axê û erdnîgariya wan digire. Em dibînin zimanê me yê kurdî weke mînak- şayik weke ava çemên Kurdistanê diherike, carina hişk mîna zinaran, carina bihêz weke şax û çiyayên Kurdistanê, carina bêcir weke sitiriyên, carina bi bihn û reng weke gul û kulîlkên xwezaya Kurdistanê...

Niha, mixabin, ev çand û huner û ziman jî hatiye qedexekirin. Dûtî siyasê, zimanê beşekî mezin yê çand û huner û edebiyata axa Mezopotamiyayê bêdeng hatiye hiştin, ku xemleke rengê cîhanê jî hatiye qedexekirin. Hem, em bi xwe jî ji ber gellek sedeman hêdî dûtî ax û heriya xweyî pêşîn dikevin!

Lê, axa ku Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran aniye ser rûyê dinyayê, dikare herdem xwe nû bike û toza salan ji ser mil û piştê xwe biavêje, dema ku li axa xwe vegere û ji wê kaniya herikî dîsa careke din vexwê: ava jiyane jê vexwe.

Di 10 Mehên Sala 2008'an De, Li Îspanyayê 53 Jin Hatine Kuştin

► **Kavûs Ezizî- Danîmark:** Ji gor lêkolînekê ku medya welatê Îspanyayê kiriye, di 10 mehên derbazbûyî ên sala 2008'an de li vî welatî, 53 jin li ber sedemên malbatî yan ji aliyê mêr yan jî hevalên wan ve hatine kuştin! Lewra jî dibêjin hevalên wan, çunkî pîrrianiya wan jin û mêrên ku li Ewropa bi hev re dijîn, ne jin û mêrê fermî, anku zewicîne, her mîna heval bi hev re dijîn, lê hinek ji wan zarok jî hene.

Ev hejmara han jî bo welatek demokratîk pîr ecêb û balkêş e, lewra jî min xwast xwendevanên Agirî haydar bin ku mixabin tenê li Kurdistanê jin li ber sedemên malbatî nahêne qetilkirin.

Buhaya Petrolê Gihîşte Jêr 60 Dolarî

► Di çend rojên borî de, buhaya niftê gihîşte jêr 60 Dolarî ku di dema 20 mehên borî de bêmînak bûye. Buhaya petrola xaw di destpêka îsal de heta 147 Dolarî jorde çûbû, lê di heftiya borî de heta bin 60 Dolarî hate xwarê. Ev hejmare nîşan dide ku buhaya niftê li gor serê salê 59 ji sedê kêmtir bûye.

Rejîma Komara Îslamî weke duyemîn welatê OPECê ye ku herî zêde petrolê

difiroşe û dişîne derve, lewra bi vî yekê gellek nigeran bûye û daxwaz ji OPECê kir ku nirxeke payedar li ser petrolê danê û nehê guhertin. Hêjayî gotinê ye ku şandina petrola xaw qasê 80 ji sedê a dahata welatê Îranê pêk tîne. Heke buhaya petrolê bi vî awayî kêmtir bibe û were jêr, dê aboriya wî welatî bi pirsgirêkên xurt û micid re berbirû bibe, ji ber ku dahata sereke ya wî welatî ji niftê dabîn dibe.



Koma Kamkaran û Şehram Nazirî Di Festîvala Muzîkê Ya FECR'ê De Beşdariyê Nakin

► Hunermendê navdar yê Kurd, **Şehram Nazirî** û **Hoşeng Kamkar**, serokê Koma Muzîka Kamkaran di hevpeyvînekê de bi medyayan re ragihandin ku ew di Festîvala Muzîkê ya bi navê FECR'ê de beşdariyê nakin. Festîvala



han taybet bi henceta pîrozkirina salvegera bidestvegirtina desthilatê li Îranê ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê ve tê lidarxistin.

Hoşeng Kamkar got ku Koma Muzîka Kamkaran di meha dawîya zivistanê û hevdem tevî wê festîvalê de, dê li 5 bajarên Amerîka û piştre jî li 4 bajarên Kanadayê konseran bidin. Ev 15 sal in ku Kamkaran li Amerîkayê konser nedane. Hoşeng Kamkar got, di van konserna de em dê bi Kurdî jî stranên bêjin.

Yekemîn Salvegera Koça Dawî Ya Mehmed Uzun

► Salekê berî niha, di roja 11.11.2007'an de, nivîskarê navdar yê Kurd **Mehmed Uzun** ji ber nexweşiyê çû ser dilovaniya xwe. Jiyan û serpêhatiya wî ya rengîn teji xizmet, xebat û berhemên giranbiha û mezin ji bo wêje û zimanê Kurdî ye ku herdem hêjayî pesindayîn û rêz û qedirgirtinê ye. Mehmed Uzun wekî kesayetiyeke rewşenbîr, nirx û sermayekî girîng yê gelê kurd tê hesabandin û tu demekê ji bîr naçe. Ji ber ku dest û



ramanên wî gellek berhemên zengîn û rengîn, weke diyarî pêşkêşî gelê Kurd kirine ku mîna çirayekê roniyê didin nişfa evîndar a îro ya wêje û zimanê Kurdî, nemaze zaravê Kurmancî. Hezaran keç û xortên Kurd rojane bi xwendina pirtûkên wî yê bi zimanek şîrîn û delal, fêrî Kurdî dibin û heta heta dê bê bibîranîn.

Di karnameya rengîn ya nivîskariya Mehmed Uzun de, heft romanên dewlemend û balkêş, gellek ceribandin, lêkolîn û helbest cih digirin ku hatine weşandin.

Di yekemîn salvegera koça dawî ya nivîskar û romannivîsê mezin û navdar yê Kurd, Mehmed Uzun de, em serê rêz û hurmetê li hember, kar, xebat û xizmetên wî ditewînin û wî bi rêz û hurmet bibîr tînin. Hêviya me ev e ku kurd bibin xweyîye gellek kesên weke Mehmed Uzun û rê û rêbaza wî ya neteweyî û serbilindane teji rêvîng be...

Desteya Weşana Agirî